Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :424 nameronahi@gmail.com 1- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Kampa Serdemê sembola berxwedanê ye

Idrîs HENAN







Duyemîn kampa koçberên Efrînê li Şehbayê, kampa Serdem e. Ev kamp li gundê Til Sosînê, di navbera taxa Ehdas û gundê Til Qirah de li ser deşteke bi qasî 11 Hiktaran berfirehe ji sê mehan ve cih digire. Di kampa Serdem de 720 kon hatine venandin. Hejmara malbatên niştecîyên kampê jî 707 in. Ango 2946 mirov in ku jê; zarokên di bin du saliyê de 300, ji 2 heya 6 saliyê 344, ji 6 heya 12 saliyê 499, ji 12 heya 20 saliyê 351 û ji 20 salan û jor de 137 in. Ji vê jimara niştecîyên kampê 688 jin û 627 mêrên zewicî hene.

**SEDEMÊN AVAKIRINA KAMPÊ**

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kampa Serdem Idrîs Weqas destpêkê de sedemên avakirina kampê ji rojnameya me re vegot û ev tişt anî ziman: Piştî êrişên qirker ên dewleta Tirkiyê û çeteyên wê li ser Kantona Efrînê, gelê me mecbûrî koçberiya ber bi kantona Şehbayê ve dibe. Herêmên Şehbayê ku li ser destê çeteyên DAIŞ hatibûn rûxandin û talankirin, bi rûpîvana



xwe ya heyî têrî hejmara şêniyên Efrînê ne dikir. Aliyê girîng jî ew bû ku; gelê Efrînê xwediyê vîna veger û rizgarkirinê bû û ne dixwest li dûrî Efrînê li ti cihekî din bijî. Di serencamê de, bi desteka Rêveberiyên Xweser û ên Sivîl li Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê Kampa Serdem hat avakirin.

**SAZÎ Û RÊVEBERÎ**

Weqas derbarê aliyên avakirin û rêveberiyê de ev agahî parve kir: Kampa Serdem di aliyê avakirinê de ji çend laperan (Kutleyan) pêk tê. Her laperk bi qasî 100×100 M çar goşe ye. Ji bo her yekê jî destşo, avdestxane û banyoyên taybet hatine avakirin. Di her laperekê de 68 kon hene. Weqas destnîşan dike ji bo birêvebirina jiyanê 11 komînên ji çar komîteyên lihevanîna civakî, tendirustî, ewlekarî û xizmetguzariyê pêk tên, hatine damezirandin. Li kêleka van komîteyan saziyên Jin, Ciwan, Çand û Huner, Perwerde, Yekîtiya Êzîdiyan, Heyva Sor a Kurdî hene.

PERWERDE

Li kampa Serdem bi desteka KPC-Demokratîk dibistanek ji 12 refan hatiye avakirin. Di dibistanê de 280 şagirtên seretayî ders dibin. Beşek ji şagirtên astên navîn û amadeyî li derveyî kampê, li dibistanên gundên derdor xwendina xwe dibînin.

**XIZMETGUZARÎ**

Destpêkê de xizmetguzarî bi destê mirovên bi tecrube û dildar dihate kirin. Piştî demek kin Şaredariyên Efrîn û Şehbayê mudexele kirin û tiştên pêwîst (valêrên ava vexwarinê, cineratorên ceyranê, destşo, avdestxane, banyo,...hwd) di kampê de ava kirin. Weqas tekez dike ku ji ber kêm derfetiyan û rewşa dorpêçê hîna jî kamp bi hewceyî avahiyên xizmetguzariyê ye. Weqas destnîşan kir ku bi desteka gelên Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê alîkariyên (xwarin, vexwarin, nivîn, firaq, madeyên paqijî û tendirustiyê,...hwd) li şêniyên kampê tên belavkirin. Li gorî wê jî li kampa Serdem her 15 rojan qifikek ji 10-15 made û pêdiviyên rojane pêk tê û mehê carekê sebze tên belavkirin.

TENDIRUSTÎ

Weqas di vî alî de tekez dike ku li Kampa Serdem xizmeta tubî tenê Heyva Sor a Kurdî li gorî îmkanên xwe pêşkêş dike. Derbarê textorên tên kampê de ev agahî da: Li gorî bernameyek taybet carinan textorên "nexweşiyên hundirîn, çerm, poz û guh, çav û nexweşiyên jinan" serdana kampê dikin. Kamp û tevahî Şehba bi awayekî lezgîn hewceyî alav û amûrên tubî, derman û textorên pispor ên mîna "dil, şekir, wêran, damar û reh, tansyon, penceşêr, şewitandin...hwd" ne. Weqas bal kişand ser kesên ku di encama van kêmderfetiyên tubî û dorpêça bi zanebûn a rejîma Sûriyê de jiyan xwe ji dest didin û got: Mixabin gelek şêniyên Efrînê ji ber van sedeman li Şehbayê jiyana xwe ji dest didin. Di kampa Serdem de gelek mirovên xwedî nexweşiyên giran ên bi hewceyî alîkariya taybet hene. Şîrê zarokan bi zorê tê dabînkirin. Ji bo zarokên yek salî û jor de şîr nayê peydakirin.

**PROJE**

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kampa Serdem Idrîs Weqas derbarê peydakirina derfet û firsandên kar ji şêniyên kampê re got: Li kampê sûkek ji 63 dikanên ku zêdeyî 150 mirovî dişuxilîne heye. Armanc xebitandin û peydakirina firsendên kar ji şêniyên kampê re ye. Weqas dibêje: Heya ji me tê em hewl didin derfetên kar li derveyî kampê jî dabîn bikin.

**SEKNA GELÊ EFRÎNÊ**

Ji ber ku gelê Efrînê gelekî birêxistinkirî ye, 58 rojan li hemberî hovtirîn şêweyên dagirkeriyê li ber xwe da. Îroj bi sekna xwe ya di mewziya duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de li Şehbayê jî xwedî vîna azad a jiyana bi rûmet e. Bi mayîna xwe ya li Şehbayê, tevî hemû zor, zehmetî, belengazî, şert û mercên dijawar ên jiyanê, îsbat dike ku; xwediyê îradeya serkeftî ya berxwedanê ye.

**EM Ê EFRÎNÊ RIZGAR BIKIN**

Hevserokê Meclîsa Rêveber a Kampa Serdem derbarê hewldanên teslîmgirtina vîna gelê Efrînê de got: Gelek aliyên ku şirîkê dagirkeriya Efrînê bûn, hewl dan li Şehbayê jî derûniya gelê me xira bikin. Texmîn dikirin wê karibin vîna gelê me li vir têk bibin. Lê qet ne dihat bîra wan ku gelê Efrînê gelekî bi hezaran sal niştecîyê vê axê ye. Gelekî welatparêz xwediyê bi hezaran şehîdan e. Dibe ku bikeve, lê dereng namîne serî hil dide. Gelê Efrînê bi sekna xwe ya dilêr a li Kampa Serdem dibêje: Em axê jî bixwin, em serî natewînin. Em ê Efrînê rizgar bikin.



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 424 1 - Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hejmara kesên ku ji ber şewatê mirin bûn 91

Hejmara mirovên ji ber şewata li Yunanîstanê mirin bû 91 kes. Nasnameya 28 qurbaniyan hê jî nekariye bê tespîtkirin. 25 kes jî winda ne. Berdevkê Arkujiyê Stavroûla Mallîrî diyar kir ku hîn 25 kes winda ne. Mallîrî diyar kir ku 59 cenazeyên qurbaniyan bi temamî şewitîne, hinek jî di nava avê de fetisîne.*R-2*



# ENKS NÎŞAN DIDE ÇETE ÊRÎŞ DIKIN

***Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe yên hov û xwînxwar Efrînê talan dikin, dişewitînin. Leşker û çeteyên dagirker rojane zilm û wehşeta xwe li Efrînê zêde dikin. Heta niha bi dehan mirovên sivîl revandine, malên wan şewitandine û dest danîne li ser milkên wan.***



### 30 KESÊN SIVÎLÊN DIN REVANDIN

Dagirker li Efrînê zilm û zordariya li ser welatiyên sivîl her diçe zêdetir dikin û di wehşetê de sînoran nas nakin. Endamên ENKS'ê didin pêşiya çeteyan û davêjin ser malan. Li navçeya Cindirêsê çeteyên dagirker avêtin li ser malên ku ENKS'ê nîşanî wan da 30 sivîlên din revandin û zêr û zivên wan dizîn.

### ENKS PÊŞENGTIYÊ JI ÇETEYAN RE DIKE

Hat ragihandin çeteyan roja 29'ê Tîrmehê bi ser navçeya Cindirêsê û gundên wê de girtin. Çavkaniyan ji Efrînê ragihandin kesên ji Efrînê ku endamên ENKS'ê ne, didin pêşiya çeteyan û malbatên ku aboriya wan baş be, pere, zêr û zîvên wan hebin, an jî xizmên wan ên li derveyî welat hene, nîşanî çeteyan didin. *R-5*

## Ji bo Şengalê banga tevlîbûna çalakiyan



Di 3'ê Tebaxê de ew ê çalakiyên cûr bi cûr li Elmanyayê bên lidarxistin. Sîwana Meclîsên Jinên Ezidî (SMJÊ) û Navenda Yekîtiya Komelên Êzidiyan (NAV-YEK) bi daxuyaniyeke nivîskî fermana 3'ê Tebaxa 2014'an ya li dijî gelê Êzidî şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyên ji bo Şengalê kirin. *R-2*

## DAÎŞ'ê 24 jin û 14 zarok revandin

Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, da zanîn ku hefteya borî çeteyên DAÎŞ'ê êrîşeke li hemberî Suweydayê pêk anîne û herî kêm 36 jin û zarok revandine. Hate ragihandin ku jin û zarokên hatî revandin ji civaka Durzî ne. Hat zanîn ku ji kesên hatin revandin 24 jin, 14 jî zarok in. *R-2*




## Komên çete yên dewleta Tirk navên xwe diguherin



Dewleta Tirk ya ku operasyoneke li ser Îdlibê ji bo xwe xeter dibîne ji bo asteng bike serî li rê û rêbazên cuda dide. Komên çete yên selefî yên girêdayî dewleta Tirkiyê ku li Îdlîbê dimînin, li dijî operasyona li ser Îdlibê hewl didin navên berê li ser xwe rakin û di bin navê Ceyş El Fetîh de xwe ji nûve bi rêxistin bikin. *R-2*

## Rêjîm êrîş dike, sivîl ji Idlibê derdikevin



Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku bombebaran û topbarana rêjîma Sûriyê li ser herêmên di bin serweriya çeteyên Xalid bîn Welîd a girêdayî DAIŞ`ê de li Hewd Yermûkê dewam dikin. Ji aliyê din ve jî bi hezaran şêniyên Idlibê bi rêya korîdora ewlehiyê ku Rûsyayê vekiriye, ji Idlibê derdikevin. *R-2*

## 400 cenaze ji goreke komî hatin derxistin

Roj bi roj şopên wehşeta DAIŞ'ê derdikevin holê. Çeteyên DAIŞ'ê ku Reqa dagirkiribûn û weke paytexta xwe ragihandibûn, bi her awayî zilm û wehşet li dijî welatiyan bikaranîn. Goreke komî ya din jî ku 400 cenaze tê bûn hat dîtin. Ji rêveberên Tîma Destwerdana Destpêkê Yasir El-Xemîs diyar kir ku heta niha wan 1650 cenaze derxistine. *R-6*

## Çalakgerên li Sêmalka silav kirin

Çalakgerên Mertalên Zindî bi daxuyaniyekê çalakiya ciwanên Rojavayê Kurdistanê yên li Sêmalka ji bo piştgiriya çalakiya Mertalên Zindî ya li Qendîlê û li dijî dagirkeriyê dest pê kirin, silav kirin. Çalakgeran gotin ku ew ê weke ciwanên weletparêz, her cihî weke Qendîlê bikin warê berxwedanê. *R-4*

## Jinên Siwêdayê rizgar bikin

Rêxistina Kongreya Star a bajarê Hesekê daxuyaniyek da û bang li civaka navdewletî kir ku li hember çeteyên DAIŞ'ê bikevin nava tevgerê û jinên Siwêda yên ku DAIŞ'ê revandine rizgar bikin. Kongreya Star diyar kir ku ew ê têkoşîna xwe ya ji bo maf û azadiya hemû jinên Sûriyê bê navber berdewam bikin. *R-3*

## Divê Sûriyeke demokratîk bê ava kirin



Nûnerê Partiya Sûriya Pêşerojê yê li Şehbayê Eladîn Xalid destpêkirina diyaloga MSD'ê bi rêjîma Sûriyê re erênî nirxand û diyar kir ku divê êdî şer li Sûriyê raweste û çareseriyeke aştiyane pêk were. Xalid wiha got, "Divê hemû aliyên Sûriyê li ser maseyê rûnên û çareseriyê pêş bixin." *R-4*

## Em ê têkoşîna xwe mezintir bikin



Berdevkê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê Sarûhan Olûç diyar kir ku divê têkoşîna civakî were xurtkirin û got, "Tecrîda li ser rêzdar Ocalan jî didome û nêzî 3 salan e nikare bi malbat û parêzerê xwe re hevdîtin pêk bîne. Divê em têkoşîna edaletê bi hêz bikin." *R-4*

## Li hember dagirkeriyê biryara xebatên hevbeş girtin



Êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li dijî başûrê Kurdistanê dewam dikin. Nerazîbûn û têkoşîna li dijî dagirkeriyê jî mezintir dibe. KNK'ê û Eniya Niştîmanî li Silêmaniyê li hev civiyan li dijî dagirkeriyê biryar dan ku bi hev re kar bikin û rêzeçalakiyên hevbeş lidar bixin. *R-4*

## Çeteyên dewleta Tirk bi hev ketin *R-2*

## Di dîrokê de fermanên li ser Êzidiyan *R-4*

# Çeteyên dewleta Tirk şêxên Idlibê girtin

***Hat ragihandin ku çeteyên koma bi navê Heyet Tehrîr El Şam pêngaveke girtinê li gundewarên Îdlibê daye destpêkirin. Di vê çarçoveyê de çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam hejmareke rûspî û şêxên eşîran ên Idlibê ku bi Navenda Lihevhatinê re civiyane da ku bi rêjîma Sûriyê re lihev bikin, girtin.***




Çeteyên koma Heyet Tehrîr El-Şam hejmareke rûspî û şêxên eşîran ên Idlibê ku bi Navenda Lihevhatinê re civiyane da ku lihevhatinê bi rêjîma Sûriyê re pêk bînin, girtin. Li aliyekî din jî tabûra Ceyş El-Fetih ava dikin.
Çavkaniyekî pêbawer diyar kir ku çeteyên koma Heyet Tehrîr El-Şam li gundewarên başûrê parêzgeha Idlibê bi hemleyeke girtinê rabûye û da zanîn ku di hemleyê de hejmarek ji rûspiyên eşîrên Idlibê ku bi Navenda Lihevhatinê ya Rûsyayê re civiyane da ku lihevhatinekê bi rêjîma Sûriyeyê re pêk bînin, girtin.
Di heman çarçoveyê de çavkaniyeke din diyar kir ku komên girêdayî dewleta tirk a dagirker li Idlibê "Eniya Tehrîr Sûriya" ava dike.
Ev enî ji van tabûran pêk tê: Heyet Tehrîr El-Şam, Eniya Neteweyî, Artêşa El-Îslam, Artêşa Idlibê ya Azad û tabûreke nû bi navê Artêşa El-Fetih.
Li aliyekî din hin nûçeyên ji Efrînê hatine, diyar dikin ku tevgerên leşkerî yên tabûra bi navê "Feyleqa Heftemîn" ku ji aliyê artêşa Tirkiyê ve nû hatiye avakirin, bi şevê li deverên sînorê di navbera Efrîn û gundewarên Idlibê de zêde dibin. Hate gotin ku gelek siwareyên leşkerî yên vê tabûrê derbasî gundê Etmê û Darazê dibin.

## Çeteyên dewleta Tirk bi hev ketin



Li navçeya Exterîn a Helebê, çeteyên Eniya 51'ê û Sûltan Mûrad bi hev ketin. Çeteyan ji hev kuştin.

Çeteyên 'Mertala Firatê' yên dewleta Tirk li herêmên dagirkirî bi hev ketin. Li navçeya Exterîn a Helebê, çeteyên Eniya 51'ê û Sûltan Mûrad bi hev ketin.
Tê gotin, ji ber ku yek ji serçeteyên 'Eniya 51.' Mihemed El-Dêrî (Kedro) ji baregeha xwe ya li Babê ji aliyê komekê ve hate revandin, şer derket.
Li gorî agahiyan her du çeteyan ji hev kuştine û li herêmê "qedexeya derketina derve" hatiye ragihandin.

## Ji bo Şengalê banga tevlîbûna çalakiyan



Sîwana Meclîsên Jinên Êzidî (SMJÊ) û Navenda Yekîtiya Komelên Êzidiyan (NAV-YEK) fermana 3'ê Tebaxa 2014'an ya li dijî gelê Êzidî şermezar kir û banga tevlîbûna çalakiyan kir. Sîwana Meclîsên Jinên Ezidî (SMJÊ) û Navenda Yekîtiya Komelên Êzidiyan (NAV-YEK) bi daxuyaniyeke nivîskî cangoriyên 3'ê Tebaxa 2014'an bi bîr anîn û banga tevlîbûna çalakiyên ji bo Şengalê kirin.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin;
"Ji bo şermezarkirina fermana 3ê Tebaxa 2014'an a li Şengalê ya li dijî gelê Êzidî, bi taybetî fermana li dijî jina Êzîdî ji bo bibîranîna cangoriyan û jinên di destê DAÎŞ'ê de weke kole hatine girtin Sîwana Meclîsên Jinên Êzîdî (SMJÊ) û Navenda Yekîtiya Komelên Êzidiyan (NAV-YEK) di 3'ê Tebaxê de ew ê çalakiyên cûr bi cûr li Elmanyayê li dar bixin. Wek SMJÊ û NAV-YEK'ê em bang li hemû Êzidiyên cihanê dikin ku rabin ser pêyan, tevlî çalakiyan bibin û bêdeng nemînin. Em bang li hemû aliyên demokratîk dikin ku piştgiriya çalakiyên ji bo Şengalê bikin."

## Rêjîm êrîş dike, sivîl ji Idlibê derdikevin



Êrîşên hêzên rêjîma Sûriyê li herêmên di bin serweriya çeteyên Xalid Bîn Welîd de li Hewd Yermûk a li rojavayê Deraayê dewam dikin. Ji aliyekî din ve jî bi hezaran şêniyên Idlibê bi rêya korîdora ewlehiyê ku Rûsyayê vekiriye, ji Idlibê derdikevin.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê ragihand ku bombebaran û topbarana rêjîma Sûriyê li ser herêmên di bin serweriya çeteyên Xalid bîn Welîd a girêdayî DAIŞ`ê de li Hewd Yermûkê dewam dikin.
Helîkopterên rêjîmê bi bermîlên teqemeniyê herêmên El-Şecre, Abedîn, El-Qesîr û Bêt Arh bombebaran dike. Ji aliyê din ve jî li aliyê Abedîn û El-Şecre di navbera her du aliyan de şer dewam dike.
Her wiha li aliyê bakur ê bejahiya Hemayê rêjîma Sûriyê derdora bajarokê Keferzêta, bajarokê El-Letmana û gundê Merebek topbaran kirin.
Rêjîma Sûriyê bajarokê Bedama yê li bejahiya rojavayê bajarê Cisir El-Şixûr dikeve, topbaran kir.
Di heman demê de, bi hezaran sivîlên ji parêzgeha Idlibê ya Sûriyê di korîdora ku Rûsyayê li gundê Ebû El-Zihûr vekiriye re derdikevin. Ev yek jî di demekê de ku tê payîn operasyoneke leşkerî li Ildibê çêbe, pêk tê. Lê ji aliyekî din ve jî Tirkiye ji vê operasyona muhtemel bi tirs e.

## DAÎŞ'ê 24 jin û 14 zarok revandin




Çeteyên DAÎŞ'ê li hemberî Suweydayê êrîşeke koordîneyî pêk anîn û herî kêm 36 jin û zarok revandin.
Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê, da zanîn ku hefteya borî çeteyên DAÎŞ'ê êrîşeke li hemberî Suweydayê pêk anîne û herî kêm 36 jin û zarok revandine.
Hate ragihandin ku jin û zarokên hatî revandin ji civaka Durzî ne.
Malpera nûçeyan a xwecihî Soueida24 û saziya çavdêriyê dan zanîn ku ji kesên hatin revandin 24 jin, 14 jî zarok in.
Hefteya borî jî, di êrîşa DAÎŞ'ê ya li dijî Suweydayê ku di bin serdestiya rejîma Şamê de ye êrîşeke koordîneyî pêk anîbûn û zêdetirî 250 kesî jiyana xwe ji dest dabûn.

## Hejmara kesên ku ji ber şewatê mirin bûn 91

Hejmara mirovên ji ber şewata li YUnanîstanê mirin bû 91 kes. Nasnameya 28 qurbaniyan hê jî nekariye bê tespîtkirin. 25 kes jî winda ne.
Hejmara qurbaniyên şewata li Yunanîstanê zêde dibe. 91 kes ji ber şewatê mirin û 25 kes jî hîn winda ne.
Berdevkê Arkujiyê Stavroûla Mallîrî diyar kir ku hîn 25 kes winda ne. Derengketina dîtina cenazeyan û kesên winda, weke kêmasiyeke rayedaran tê dîtin. Lê belê tê gotin, hin ji kesên winda dibe ku di nava cesedên ji cihên şewatê hatine anîn de bin.
Mallîrî diyar kir ku 59 cenazeyên qurbaniyan bi temamî şewitîne, hinek jî di nava avê de fetisîne. Hate ragihandin ku 4 ji birîndaran li nexweşxaneyê dema dihatin dermankirin mirine.
Mûxalefeta Yunanîstanê jî rexne dike ku hikumet bi zanebûn hejmara qurbaniyan vedişêre. Karê ji bo lêgerîn û rizgarkirinê dewam dike. Rayedar li ser wê yekê disekinin ku şewat dibe ku bi zanebûn hatibe derxistin.





# 47 sale bi kemençeyê re dijî

***Ehmed Tehlo ku weke bavê Şêxmûs jî tê nasîn yek ji kemançejenê gundê Werdiyê yê girêdayî navçeya Amûdê ye û ji zaroktiya xwe de li Hesekê dijî. Ehmed Tehlo ku temenê wî 62 sale, ev 47 sale li kemençeyê dide. Tehlo dibêje ku kemençe parçeyek ji jiyana wî ye.***



Ehmed Tehlo ji 15 saliya xwe ve aşiqê kemançeyê dibe. Ji tenekeyeke rûn kemançeyekê ji xwe re çêdike. Ji 15 salî heya 62 saliya xwe li kolan, şevbêrkan kemançeya xwe li gel xwe digerîne û dilê gel pê xweş dike.
Ehmed Tehlo (Bavê Şêxmûs) yek ji kemançejenê gundê Werdiyê yê girêdayî navçeya Amûdê ye. Ehmed di zarokatiya xwe de li gel malbata xwe koçî bajarê Hesekê dibe û heta niha li Hesekê dijî.
Taybetmendiya Ehmed Tehlo ji kemançejenên din ew e ku kamançeya xwe ji tenekeyê rûn çêkiriye û di nava welatiyên Hesekê de navdar e. Tehlo ku niha 62 salî ye, di 15 saliya xwe de aşiqê muzîkê dibe û dibêje ku birayê wî yê mezin ji tenekeyan amûrên muzîkê çêdikirin û ew jî çav li birayê xwe dikir. Tehlo di 15 saliya xwe de kemançeyekê ji tenekeyeke rûn çêdike û ev nêzî 45 sal e li kamençeya teneke dixe û li kolan, şevbêrk û zemawendan dilê welatiyan xweş dike. Tehlo girêdana xwe bi kemançeya xwe re wiha tîne ziman: "Her tim li cem min e, dema ne li cem min be ez nexweş dibim."
Tehlo di destpêkê de tembûrek ji tenekeyan çêdike, piştî ku fêrî tembûrê dibe xwest fêrî kemançeyê jî bibe û ji dengê kemançeyê pir hez dike. Tehlo diyar kir ku derfeta wî ya kirîna kemançeyekê tune bû û xwest kemançeyekê ji tenekeya rûn çêke û wiha got: "Min gelek kemançeyên teneke çêkirin lê baş deng jê nedihat û herî dawî ez gihaştim dengê ku ez dixwazim."
Tehlo li ser çêkirin û fêrbûna kemançeya xwe wiha dibêje: "Ji ber rewşa xizantiyê her kesekî nikaribû amûrek muzîkê bikire. Ji ber vê yekê min xwest ku ez kemançeyekê ji tenekeya rûn çêkim. Min ji dengê kemançeyê pir hez dikir. Piştî ku min kemançeya xwe çêkir, min bi xwe re dibir çolê li ber pez û min xwe fêr dikir. Xelk dihatin cem min, ez diçûm cem wan. Me şevbêrk çêdikirin û min di wan şevbêrkan de li kemançeya xwe ya teneke dixist."
Her çendî di destpêkê de derfetên Tehlo yên ji bo kirîna kemançeyekê nebûn jî, piştre jî nexwest bikire ji ber ku ji dengê kemançeya xwe ya teneke hez dike û fêrî wê bûbû. Çar zarokên Tehlo hene, lê zarokên wî bi muzîkê ve eleqedar nabin. Tehlo piştî Şoreşa Rojava di Koma Şehîd Hogir a dengbêjan ya girêdayî Navenda Çand û Hunerê ya Hesekê de kar dike.

## Jin afrînera çandê ye

Endamên Koma Dengê Jinên Azad anîn ziman ku çand û hûner bi destê jinê hatiye avakirin û diyar kirin ku ger çand û hûner tune be jin jî tune ne.
Endamên Koma Dengê Jinên Azad rola jinê di qada çand û hunerê de vegotin û diyar kirin ku jin ji dîrokê û heta niha afrînerên hunerê ne.

**HUNER BI JIYANÊ TÊ AVA KIRIN**

Hûnermenda Koma Dengên Jinên Azad Sema Ozel Asî, anî ziman ku çand û hûner tim bi heve girêdayî ne û diyar kir ku mirov nikare çand û hûnerê ji hev veqetîne. Sema, diyar kir ku çand û hûner ji bo jinan gelek girîng e û wiha got: "Çand û hûnerê bandoreke mezin li ser jinê kiriye. Ji ber ku hûner jin e. Ji ber huner estetîk e xwezaya wê jin e. Dema jinek dibe dayik ji zarokên xwe re lorikan dilorîne, stranan dibêje. Bi vî awayî çand û hûner pêş dikeve. Her wiha hûner di xwezaya jinê de pêş dikeve. Çand û hûner bi xwe ava nebûye. Hûner tim di nava jiyana jinê de hatiye avakirin. Dema ku em dibêjin çand ev jî di nava jiyana jinê de heye. Ji ber ku jin dema diçûn çandiniyê û aletên ku bi kar dianîn hemû pênaseya çandê bûn. Di dema niha de dema ku em wekî jin bi hûnerê eleqeder dibin em bi gelek pirsgirêkan re rûbirû dimînin."
Sema, di berdewama axaftina xwe de bilêv kir ku dema xebatên çand û hûnerê dimeşînin bi gelek pirsgirêkan re rûbirû dimînin, lê ew têdikoşin û ev tişt got: "Mirov dikare ji dîrokê jî minaka jinên têkoşer yên wekî Eyşe Şan, Meyrem Xan mînak bide. Di dirokê de ji bo hûner hinek bê ziman gelek xebat hatin kirin û di dema van xebatan de jî pirsgirêk hatin jiyîn. Lewra jî di çand û hûnerê de cih û şopa jinê hîn heye û winda nebûye. Em ê nehêlin ku winda bibe. Dema ku mirov xwedî çanda xwe dernekeve mirov asîmîle dibe. Banga min ji jin û ciwanan re ew e ku xwedî çanda xwe derkevin."


**JIN BI STRANAN XWE AZAD HÎS DIKIN**

Hûnermenda Koma Dengê Jinên Azad Kudret Uçuk jî da zanîn ku dema jin hûnerê ava dike bi hêstên xwe çêdike û wiha got: "Jin di çandê de azadî û cuda bûna xwe dibîne. Hûner tiştekî gelek mezin e. Çand û hûner ji gelek beşan pêk tê. Jin dema stranan dibêjin xwe azad hîs dikin û dibînin ku hûner û çand tiştekî çawa mezin e. Rihê jinê bi stranan derdikeve holê. Ji ber ku jin dema stranan dibêjin êş, kêfxweşî û hebûna xwe tînin ziman. Nêzîkî 3-4 sal in li dijî çanda kurd êrîşên gelek dijwar tên kirin. Ji ber van êrîşan gelek saziyên me yên çandê hatin girtin û ji ber vê jî xebatên me ne wek berê dimeşin. Lê li aliyekî jî divê em zû dev ji têkoşînê bernedin û heta dawiyê xwedî çanda xwe derkevin."
Kudret, bi lêv kir ku çand û hûner tim girêdayî jinê ye û ev tişt got:



"Jin di hêla jiyanê, xebatê de di pergala baviksalar de, pirgirsgirêkan dijî. Ji ber vê divê em li hember van tiştan serî rakin û jî hêla hûnerê de xebatên xwe berdewam bikin. Em bawer dikin ku têkoşîna jinê wê îro jî berdewam bike. Em ê çand û hûnerê di pêşerojê de diyariyî zarokan bikin. Çand û huner hebûn û pêşeroja me ye. Bi taybetî jî jinên ciwan divê xwedî hûnerê derkevin û ji civakê re bibin mînak."

## Muzexaneya dîrokî tê sererastkirin



Rêxistina Roiya ya girêdayî UNESCO'yê bi piştgiriya Komîteya Turîzm û Şûnwaran a Meclisa Sivîl a Reqayê dest bi xebatên sererastkirina muzexaneya dîrokî ya kolana El-Mensûr a Reqayê kir.
Berpirsê xebatên sazkirinê yê rêxistina Roiya Umer El-Mûh wiha got: "Muzexaneya Reqayê ji şaristaniyên kevn ên ku li Reqayê jiyane, bermahiyan dihundirîne. Em ji ber kêmbûna madeyên pêwîst zehmetî di meşandina xebatên tamîrkirina muzeyê de dikişînin. Niha muze ji bermahiyên DAIŞ'ê tê paqijkirin û her wiha baxçeyê muzeyê jî hatiye paqijkirin."

**DÎROKA WÊ**

Muzexane di dema dagirkeriya Osmanî di sala 1861'an de hatiye avakirin. Berê wek sera tê bikaranîn û di 24'ê Cotmeha 1981`an de wek muzexane hat bikaranîn.
Muzexane li navenda bajêr cih digire. Qad bi navê Qada Muzeyê tê naskirin. Muze dabeşî du qatan dibe, her qatek beşekê dihewîne. Beşa yekemîn vedîtinên mîsyonên arkeolojîk û beşa duyemîn bermahiyên Ebasiyan ên dîrokî li Reqayê dihewîne.
Çeteyên DAIŞ'ê muzexane talan û wêran kir û her wiha hemû bermahiyên dîrokî dizîn û peykerên dîrokî şikandin, ji wan tabloyên nîgarkirî, guharên zêrîn, pereyên medenî yên cuda, lembeyên kevn, neqşe û nivîsên ku dîroka wan vedigere serdemên cuda û gelek parçeyên dîrokî yên kevn.
Niha tenê hejmarek ji tabloyên nexşekirî yên ku dîroka wan vedigere sedan salan li muzexaneyê hene…*ANHA*

## Êdî helbestên berxwedanê dinivisîne



Xwe bi xwe fêrî zimanê kurdî bû û dest bi nivîsandina helbestan kir. Ji rewşa ku kurd tê re derbas dibin, bi dehan helbest derxistin.
Her wiha gelek kes fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî kirin.
Cîhad Hemdûş 69 salî ye, ji gundê Xirbê Şera yê navçeya Şera ya Efrînê ye û bavê 3 zarokan e. Niha li gel malbata xwe li gundê Ziyaretê yê navçeya Şêrawa dimîne.
Tevî ku zimanê kurdî ji aliyê hêzên mêtinger ve rastî dihat helandin jî Hemdûş bi rêya gundarkirina li Radyoya Êrîvanê ya bi zimanê kurdî û xwendina belavokan xwe fêrî zimanê kurdî dike. Herî dawî xwe fêrî gramerê dike û dibe mamosteyê zimanê kurdî. Dema leşkeriya rêjîmê dikir, ciwanên kurd jî fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî kirin.
Hemdûş di dawiya salên 80'yî de dest bi nivîsandina helbestan dike, li ser komkujiyên li dijî gelê kurd, wekî Helebçeyê helbestan dinivîse. Helbesta wî ya yekemîn bi navê "Ziyana Helebçe" bû, helbesta xwe cara yekemîn di Newroza Efrînê ya 1991'an de xwend.

**XWENDEKARAN FÊR DIKE**

Di dema êrîşên dijwar ên komên çete li ser gundê Qestel Cindo di sala 2013'an de, Hemdûş di bin topbaranê de xwendekarên gund fêrî zimanê kurdî dikir. Xwendekarên ku li ber destên wî mezûn bûne niha bûne mamoste.
Her wiha Hemdûş gundiyên Xirbê Şera û Qitmê yên navçeya Şera jî fêrî ziman kirin.
Cîhad Hemdûş bi dehan helbest li ser mijarên cuda, herî zêde têkoşîna gelê kurd bi zimanê kurdî nivîsandine û di 3 dîwanan de (Bihara Gelan, Banga Welat û Kew û Kewgiran) kom kirine.

**BÛ DENGÊ BERXWEDANA EFRÎNÊ**

Bi dijwariya êrîşên hêzên dagirker ên li ser Efrînê, helbestvan Cîhad Hemdûş wekî bi hezaran xelkên Efrînê berê xwe da Şehbayê. Li vir jî hestên helbestvaniyê li gel wî mezintir dibin, êdî li ser berxwedanê, azarên gel û hovîtiya çeteyan helbest dinivîse.
Hevjîna Cîhad Hemdûş Fadya Beyar ku mamosteya zimanê kurdî ye diyar kir ku Hemdûş beriya 16 salan bi rêya pirtûka Osman Sebrî ew fêrî zimanê kurdî kiriye…*ANHA*

# 400 cenaze ji goreke komî hatin derxistin

**Roj bi roj şopên wehşeta DAIŞ'ê derdikevin holê. Çeteyên DAIŞ'ê ku Reqa dagirkiribûn û weke paytexta xwe ragihandibûn, bi her awayî zilm û wehşet li dijî welatiyan bikaranîn. Goreke komî ya din jî ku 400 cenaze tê bûn hat dîtin. Ji rêveberên Tîma Destwerdana Destpêkê Yasir El-Xemîs diyar kir ku heta niha wan 1650 cenaze derxistine.**

Tîma Destwerdana Destpêkê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê xebatên rakirina cenazeyên mirovan li Baxçeyê Sewalan bi dawî kir. Tîmê 400 cenaze ji baxçe rakirin.
Xebatên derxistina cenazeyan ji gorên komî ku çeteyên DAIŞ`ê bi rengên hovane sivîl qetil dikin û dikirin wan goran, ji aliyê Tîma Destwerdana Destpêkê bê navber dewam dike. Di vê çarçoveyê de, bi hevkariya şêniyên taxa El-Bedu ya bajarê Reqayê, Tîma Destwerdana Destpêkê goreke komî ya nû li Baxçeyê Sewalan dît. Di gora komî de, li gorî tîmê 400 cenazeyên mirovan hatin rakirin. Ji rêveberên Tîma Destwerdana Destpêkê Yasir El-Xemîs têkildarî mijarê ev tişt anî ziman: ″Em xebatên rakirina cenazeyan ji bajar û derdora bajarê Reqayê berdewam dikin. Heta niha me hezar û 650 cenaze rakirin. Piraniya gorên komî bi hevkariya şêniyan hatin dîtin.″
El-Xemîs bang li şêniyên bajar kir ku ger komên gorî yan jî cenaze dîtin, yekser Tîma Destwerdana Destpêkê agahdar bikin.
Tîma Destwerdana Destpêkê, Tîm girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê ye û bi destpêkirina Pêngava Xezeba Firatê ya rizgarkirina bejahiya bajarê Reqayê re hate avakirin. Bi demê re, endamên Tîma Destwerdana Destpêkê xebatên xwe bi pêş xistin û bûne pispor.



Endamên tîmê ji bo derxistina cenazeyan tevî derfetên kêm, pir bi baldarî kar dikin. Di nava endamên tîmê de bijîşkek jî heye û ew jî cenazeyan tevî belgeyan îspat dike. Piştî ku cenaze tên derxistin û tên belgekirin, li goristanan têne veşartin…*ANHA*

# Xebatên saziyan yên 6 mehan hatin nirxandin



Meclisa Navçeya Dêrikê bi şêniyan re civiyan û xebatên saziyan ên 6 mehan nirxandin

Meclisa Gel a Navçeya Dêrikê bi armanca nirxandina xebatên 6 mehan ên saziyan civîneke li dar xist. Bi sedan şêniyên navçeyê, hevserokên Meclisa Herêma Dêrikê Zelfa Mihemed û Ebdulherman Mihemed, rêveberên Meclisa Kantona Qamişlo Mezlûm Yûsif, hevserokên komînan, endamên saziyên civaka sivîl, nûnerên hêzên Asayîşê û Trafîkê amade bûn.
Civîn bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Paşê rapora xebatên 6 mehan a meclisa navçeya Dêrikê ji aliyê Hevseroka Meclisa Navçeya Dêrikê Dîlber Osman ve hate xwendin. Paşê jî deriyê nîqaş û nirxandinê li pêşiya beşdaran ve hate vekirin.
Hin beşdaran rexne li şaredariyê kirin ku li ser paqijî, sererastkirina riyan, nebaşbûna nan û kêmbûna avê nasekinin. Her wiha hate gotin ku di navbera saziyan de koordîne tuneye.
Hin welatiyan îşaret bi Muduriyeta Aborî ya Dêrikê kirin ku erka xwe ya kontrolkirina madeyan û buhayên wan, her wiha xerçkirina avê baş bi cih naynin.
Rêveberê Meclisa Kantona Qamişlo Mazlûm Yûsif axivî û got: "Meclisa kantonê wê li ser rexne û pêşniyaran bisekinin û heya karibin rê nedin ku kêmasiyên berê derketina dubare bibin."

# 3'ê Tebaxê birîna ixanetê

**Melek DEMÎRTAŞ**



Êrîşa 3'ê Tebaxê çerxek û mîladek bêbext e, a ku ji bo Êzîdiyan fermana 74'ye. Êrîşa DAIŞ´ê li ser Şingalê, dikeve sala xwe ya 4'an de, ev êrîş bi armanc tunekirina mîrateyên kurd û mirovahiyê pêk hate, her wiha bi vê qirkirinê, vîna wan bişikînin. Piştî 3´yê Tebaxê ji bo Êzîdiyan tu tişt nabe mîna berê, her mîna muhreke îxnetê di dîroka mirovahiyê de wê bimîne. Êzdiyan gotin ku dê wê 74 feramn ji bo Êzdiyan ya dawî be, ji ber bi saya YPG û YPJ me xwe birêxistinkir û hêza YBŞ û YJŞ'Ê avkir, emê ne mîna berê bê hêzin"

## ŞEVEK TARÎ Û BÊBEXT

Welatiyê Êzdî bi navê T Ş di kampa Newroz de çîroka fermana 74'an bi keserk êş ji rojnameya vegot: "Di 3'ê Tebaxê de şevek tarî û bê bext çeteyên DAIŞ'ê êrîşî şingalê kir, qaşo pêşmerge parastina me bikin, lê bêyî ku guleyekê bi teqînin reviyan û me bê parastin hiştin. Nabera du satan de DAIŞ'ê Şingal dagirkir û fermana 74 li dijî Êzîdxaniyan bi xicera ixantê pêk anîn."

## MÎNA VÊ HOVÎTİYÊ TU PİRTÛKÎ DE NEBÛYE

T Ş bal kişand ser zehmetî û êş dema reviyan û wiha pêde çû: "Di tarîtiya şevê de em ji zilm û hovîtiya DAIŞ'ê reviyan, em rastî pir zehmetî û zordarî hatin, du rojan bê navber bi lingên tazî meşiyan. Me tî, birçî, nexweşî û tirs dît, her wiha ez û malbatên xwe li ser esasê ku pêşmerge werin me xilas bikin 4 rojan di newalekê de bêyî tiştek xwarin, vexwarin û razanmen, her wiha dayika min nexweşiya şekire; got min li vir bihêlin lê, qet wê nav destên xwîn mijan nahêlin. piştre me berê xwe da çiya bi hezarên mirovan ji ber ku hêza wan têrnedikir dayik, kal û zarokên xwe li çiya hiştin, her wiha pir jinên Êzdî da ku namûsa xwe biparêzin û nekevin destên DAIŞ'ê xwe ji zinaran avêtin. Ev hovîtî di kîjan kîtabê olî de nivîsye, ev ne tenê ferman bû ev çerxeya mîladek reş û bêbext bû."

## Jİ NERÊXİSTİNKİRİN KOMKUJÎ ZÊDEBÛ

Ev 4 salin ser fermana 74 an derbasbû lê, ku li Şingalê lêkolîn bêne kirin wê gorên komkujiyan bibînin, nêzî 47 nefrên ji me malbata min di destên DAIŞ'ê dîl hatin girtin ku heya zarokê17 rojî ji hovîtiya DAYIŞ'ê bê par nema. Lê di pêngava rizgarkirina Reqayê de ku QSD'ê beriya zêdeyî salekê destpêkiribûn gelek Êzdî ji destên çetyên DAYIŞ'ê rizgar bûn. Herger di wê demê mîna niha Şingal bi hêz û rêxistinkirî ba wê ev fermana bêbext bi serê me nehatibe."

## IXANET Û KOMKUJÎ YEK RÛNE

Ez wekî Êzdî ji hemû ol, netewî û ziman re rêzdariya min heye lê, dema DAIŞ'ê digot Êzdî kafrin, ma ew xwedanê ku min daye ne hemû ol û netew û mirovahî daye, çima Êzdî ha, ev pirsa min ji hemû oldar û xwedî wijnadî reye. Lê yên ku alîkariya çeteyên DAIŞ kirin ku derbasî Şingalê bûn, ew ji DAIŞ'ê zêdetir sûçdarin û pêwîste bêne muhasebekirin."

## 3'Ê TEBAXÊ BÊBEXTİYA MİROVAHİYÊ YE

Kirîd Umer bi temenê xwe 80 salî jî Şerfedînê hovîtiya DAIŞ'ê û rizgarkirina wan wiha vegot: "Ku min karîba ew şeva tarî ne hevok û ne jî pitûk têrêdike ku bêjim, roja 3'ê Tebaxê rojek tarî û bêbxtbû. Ev êrişên çeteyên DAIŞ'ê li ser Şengalê weke berdewama fermana 73'an e, carna ez raman dibim û ji xwere dibêjim ku YPG û YPJ'ê me neparastibana û korîdora ewlehiyê ji mere venekiribane wê çi biserê me hatibe, bi say wan em ji qirkieinê xilas bûn, heya di oxisra parastina me de gelek keç û xort şehîd bûn. Ji bo ku em Êzdîxan layîqî fedekariya wan şehîdan bin, Şingaliyan xwe birêxistin û perwerde kirin, jiber yek ji sedemên vê sosrtê nerêxistinkirin bû, Lê fermana 74'an bi rêxisrin û hêza YPJ û YJŞ'ê wê ya dawî be, êdî bese ji dubarekirina dîroka îxanetê re."





## HECEYÎ ALÎKARİYÊ NE


Kirîd ser reşa kampê axaftina xwe bi dawî kir: "Rêxsiztina mirovahî nema mîna berê alîkariyê dike, her wiha di milê tendrustî de jî gelek hewcedariyên me hen gelek koçber hene pêwîstiya wan bi amelîyat heye."

## Jİ 12 HEZAR TENÊ 100 MALBAT MEN

Endamê Mcilsa Rêvebiriya Kampa Newroz Hadî Mixêbir ser reşwa kampê ev agahî dan: "Di destpêkê de zêdeyî 12 hezar malbatên Şingalê li kampa Newroz bi cih bûn, piştî YPG û YPJ û YBŞ Şingal ji çeteyên DAYIŞ'ê rizgarkirin gelek malbat vegeriyan warên xwe, ji bo wê nêzî 100 malbat li kampê mane. Ev 2 mehin ku rêxistina RS ji ber bi dawîkirina peyama wê bi kampê, her wiha ji ber piranî rêxistinê mirovahî berê xwe dane Kampên li Şehbayê, ji bo wê mîna berê alîkarî nayê kampê. JI bo wê daxwziya me ji Rêvebiriya Xweser ku alîkariya kampa Newroz bike."

## KAMP HEWCEDARÎ DERMANİN

Hadî bal kişand ser pêwîstiyên kampê û wiha got: "Kamp hewcedarî pêwîstiyên jiynê ye, bijîkên jin û giştî jî hene, lê di milê derman de kêmanî heye tenê dermanê sivikin, lê dermanê şekir, dil, fişar tuneye, her wiha şîrê zarokan heye. Di milê ceyran, av û xaz di kampê de başe."



# Şoreş, bi pirtûkan xwedî dibe

**Medenî FERHO**

Sêyemîn xet, lêgerîna rastiyê ye, rastî di şoreşê de dikare bersiva xwe bibîne. Şoreş, gel e, guhertina ji jêr û ber bi jor ve ye, avakirina sîstema gelê demokratîk e!..
Kurdan, gavên cîhanî û însanî avêtine; bi ciddiyet di xeta sêyemîn de dimeşin. Riya şoreşê bi efsûn e, gelek kelem û astengî hene. Biqasî dijminên hundir nebe jî, dijminên hundir jî hene. Lewma, min behsa agir û ava di destên Selahaddîn Eyyubî de kir. Abdullah Ocalan jî, dilsoziya li gel "avê" nîşan da. Lê dijmin bi agir bersiv dayê.
Agir şer e, av aştî ye!.. Dewletên li ser xaka Kurdistanê hatine avakirin, agir bijartin e... Kujerên rastiyê ne!.. Kuştina rastiyê jî kuştina mirovahiyê ye.
Pîvana şarîstanî, modernîte û demokrasî, pirtûk in. Pirtûk nasnameey gelan e û neynika dema xwe be!...
Dagirkerên Kurdistanê pêşî nasnameya Kurdan kuştin. Bi girtina medrese-dibistanên Kurdî jî neynika pêşerojên Kurdan şikandin; şikandina neynika pêşerojan, paşeroja Kurdan kor dike.
Îro, pîvana şaristanî bûye teknîk, teknîk jî bûye hêza dewletî. Dewlet jî zor e. Hêza dewletî demokrasî nayîne, modernîtê jî di kirasê bazirganî de qebûl dike û hiqqê civakê kuştiye, hiqqê bazirganî serdest kiriye. Dema hiqqê civakê hate kuştin, terora dewletê dest pê dike. Vê terorê jî bi qanunan meşrû dikin; ti qanun nikarin zor û terora dewletê meşrû bikin.
4 dewletên li ser xaka Kurdistanê hatine ava kirin, bi nav komar in, lê otorîter in, otorîteya wan agir e, ne pirtûke , ne jî akademîk e. Lewma meşrûiyeta wan ya komarî, cumhuriye, cemahîrî di nîqaşê de ye. Cendirme ne!... Iran, di aliyê ferhengî de (sîstema mollayan hinekî kor kiribe jî), ji yên din cûda ye. Teva rejîmên zindan û dardekirinê ne!..
Li dijî Kurdan, hevkariyek egoîstş û di rengê faşîzmê de ava kirine. Bi bêşermî jî, ji demokrasî re serenadan dilorînin. Îdeala wan , tenê xwarina "mêweya memnû" ye. Ehl-î haram in û rrgumanên olî û neteweyî bikartînin. Ev jî îdeala faşîzmê ye.

Hîtler, di pirtûka "Şerê Min de", dibêje, "ez gelê xwe, li hemberî Cihutiyê diparêzim". Erdogan jî dibêje, "ji bo bekaa dewleta me"... Hitler, pirtûk şewitandin, Erdogan, her cûre sazî, weşanên kulutrî û civakî qedexe kirin. Yekî bi şewatê, yê din bi ferman û zindanê, erdek nikarokî, zigirî û agirî derdxiste holê.
Formula diyalektîkê yek e; herka çemê jiyanê û guhartin e. Şoreşa Başûr herka dîrokê û guhertin e. Bi Şoreşa Rojava re, gelan cîhanek nû dîtin, xwe naskirin, dewlet naskirin. Fêm kirin, "dewlet ne ji bo gelan, gel ji bo dewletê heye û kole ye". Di serdema 4,. ya Roma de jî, şagirtên Îsa û şagirtên şagirtên Îsa, bi Roma dane qebûl kirin ku, ji bilî cîhana kole-efendî û zora şûr û qazoxan, rastiya rastî heye û ew jî rastiya gelan e. Heyecan, derfet, hêvî bû deriyekî nû û dengekî nû vekirin!...
Şoreşa Rojava ev heyecan, derfet û hêvî ye. Ji bo ku ev şoreş bibê "mabeda demokrasî" divê, hemleya pîrtûkan werê dest pê kirin. Dibistan, akademî bê pirtûk nabin. Sicîlnameya şoreş e, av e... Av jî pirtûk in... Şoreşa, bê pirtûk nikare bibe ava agirkuj... Divê Şoreşa Rojava bi
pirtûkan werê xwedîkirin.
Atlasê mêjiyê Kurd jî hatiye dagirkrin. Divê eb mjiyê dgairkirî bi şerê gotinê werê rizgar kirin. Mêjiyê rizgarkirî bi xwe, bi kultur û hêza ferhenga xwe bawer e.

Rewşenbîrên Kurd, mixabin newerin bi navê rewşenbiriyê haraket bikin, ditirsin, tirsa wan, ji wan e, ji nekariya gotin û nivîsandinê ye. Divê her nivîskarê Kurd, bibê dînê nivîsandinê... Pirtûk, gotin wîandîn û har bike. Her pirtûka bi zimanê Kurdî , wê di destîniya paşerojên Kurdan de, bibe nefesek.



# Jinên Siwêdayê rizgar bikin

***Rêxistina Kongreya Star a bajarê Hesekê daxuyaniyek da û bang li civaka navdewletî kir ku li hember çeteyên DAIŞ'ê bikevin nava tevgerê û jinên Siwêda yên ku DAIŞ'ê revandine rizgar bikin. Kongreya Star diyar kir ku ew ê têkoşîna xwe ya ji bo maf û azadiya hemû jinên Sûriyê bê navber berdewam bikin.***

Kongreya Star a Hesekê bang li civata navdewletî kir ku bi lez li hember çeteyên DAIŞ'ê bisekinin û jinên Siweydayê yên ku hatine revandin rizgar bikin. Kongreya Star her wiha soza berdewamkirina têkoşîna rizgarkirina hemû jinên Sûriyê da.
Dehan endamên Kongreya Star a Hesekê li ber Navenda Kongreyê li taxa El-Nasra ya bajarê Hesekê kom bûn û ji bo şermezarkirina kiryarên çeteyên DAIŞ'ê yên li dijî jinên parêzgeha Siwêdayê daxuyanî dan û banga rizgarkirina wan kir.
Daxuyanî ji aliyê endama rêveber a Kongreya Star Evîn Paşo ve hat xwendin.
Daxuyanî wiha ye;
"DAIŞ'a terorîst ji destpêka ku ava buye hemû netew û olan hedef digire. Herî dawî, di 25'ê Tîrmehê 2018'an de êrîşek berfireh li ser parêzgeha Siweydayê û gundewarên wê pêk anî. DAIŞ'ê di êrîşên xwekuj de sedan sivîl, jin û zarok qetil kirin. DAIŞ'ê xwest bi van êrîşan ewlehî û aramiya herêmê têk bibe û têkçûna xwe li Sûriye û Iraqê veşêre.
Ev êrîşa li ser Siwêdayê, êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Kobanê, revandina jinên Şengalê tînin bîra mirov. Îro ev yek li ser jinên El-Siweydayê dubare bû.
Em weke Kongreya Star a bajarê Hesekê van êrîşan şermezar dikin. Em bang li civata navdewletî dikin da ku bi erka xwe rabin û hemû Jinên Durzî bi lez ji destê DAIŞ'ê rizgar bikin. Em weke tevgerek jinan soz didin ku ji bo mafên jinan û avakirina jiyanek azad em ê têkoşîna xwe bidomînin."



# Ji bo em derkevin her sal dişewitînin



Li Omeryana ku her sal bi şewatên daristanan tê rojevê, dîsa çar roj berê şewat derket û li gundan belav bû. Yek ji van gundan gundê Serêkaniyê bû. Terfa Yildirim a ji gundê Serêkaniyê got: "Ji bo em ji vir derkevin û biçin, vê her sal dikin."
Li herêma Omeryan a girêdayê Nisêbîn a Mêrdînê sê roj berê qedexeya derketina derve hat îlankirin û piştî vê şewat derket, bi hezaran hektar daristan tune kir. Şewat gihişt heta gundên derdorê û di şertên zehmet de hat temirandin. Yek ji gundên ku şewat gihiştê Serêkaniyê bû. Li gund yek sewalek û baxçeyek nema. Jina bi navê Terfa da zanîn ku li gund tenê çend malbat mane û dixwazin wan jî bidin koçberkirin.
Terfa ya roja bûyerê vegot, diyar kir ku ji dûmana ji lutkeyên çiyan bilind bûye, şewat derketiye û wiha got: "Ji ber ba şewat zêde bû. Ba gurr bû. Me sibehê saet di 9'an de şewat dît û êvarê saet di 4'an d e gihişt gund. Em giriyan, me alîkarî xwest lê kes nehat. Herî dawî kurê min xwe avêt agirkujê. Agirkuj hat. Agirkujê jî av avêt û çû. Bi ava wan agir kêm nebû."
Terfayê destnîşan kir ku ji ber şewata derdiketiye sewalên wê telef bûne, xaniyê wan zirar dîtiye û got her sal vê yekê dijîn û ji ber şewatê nikarin darekê biçînin û sewalan xwedî bikin.
Terfayê di dawiya axaftina xwe de bertek nîşanî rewşê da û diyar kir ku ji bo wan ji vir derxînin û bidin koçberkirin her sal van deran dişewitînin. Terfayê got ew ji gundê xwe dernakevin.

# Meclisa Jin a Tebqayê rêze semîner da destpêkirin

Li ser bingeha pêşxistina asta zanabûnê ya jinan, Meclisa Jin a Tebqayê li gundewarên rojava û rojhilatê herêmê rêzesemîner da destpêkirin.
Semînera yekemîn li Mala Jinê ya Mensûra bi beşdarbûna bi dehan jinên di nava sazî û meclisan de hate dayîn.
Semîner ji aliyê Berdevka Komîteya Jin a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê Cuheyna Misto û Rêvebera Mala Jinê ya Mensûra Nesra Ebakê ve hate dayîn. Mijara semînerê li ser "Di Netewa Demokratîk de Hevjiyana Azad û Zayendperestî" bû.
Cuheyana Misto di semînerê de axivî û got, "Di encamên civaka baviksalarî, jin hatibû paşguh kirin û kolekirin, her wiha li dijî jinan qirkirina çandî pêk anîn."
Cuheyna anî ziman ku "Civaka ku jin tê de azad nebe, ew civak ne azad e."
Rêvebera Mala Jinê ya Mensûra Nesra Ebakê, li ser mijara zayindperestî, serweriya hişmendiya zilamê serdest, jin wê çawa li hember vê zihniyetê bisekine axivî.
Nesra Ebakê wiha got, "Malbat tova civak, dewlet û zilam e. Zilam çi bav be, çi bira an xwe xwekî serwerê malbatê dibîne, biryara yek û ya dawî ya wî ye ku li ser jinan ferz dikin. Bi her awayan mudaxele li jiyana jinan dikin."



Di dawiya semînerê de beşdaran behsa pirsgirêkên ku tên serê wan kirin.
Semîner di nava hefteyekê de li gundewarên Tebqayê wê werin dayîn…*ANHA*

# Dijmin ji jina birêxistinkirî ditirse

**Şîlan XOCE**



**Endama Koordînasyona Kongra Star li Kampa Serdem Galya Mihemed da zanîn ku yek ji taybetmendiyên êrişîn bi ser Efrînê ve hatine, hedefgirtina kesayeta jin bû. Galya got, "Dewleta faşîst a Tirkiyê dixwest di şexsê jina zana û pêşeng a Efrînê de hemû jinên ji bo azadiya xwe têdikoşin têk bibe. Armanca dewleta Tirk ew bû ku jina zincîrên koletiyê bi şoreşa Rojava re qetandiye, ji nû ve weke kole û eşya li bazarên koledariyê bifiroşe. Dewleta Tirk ji jinên ku xwe di bin siya felsefeya Rêber APO de birêxistin kirine ditirse. Ji ber vê jî di serî de êrişî jin û ciwanan dike."**

## RÊ LI BER KEYSBAZAN HAT GIRTIN

**Galya xebatên Kongra Star li Kampa Serdem ji me re nirxandin û ev tişt anî ziman: Berê de Kongra Star li Efrîn û Şehbayê xwe birêxistin kiribû. Çawa ku gelê me hate Şehbayê, derbasî nava gel bû û ne hişt armancên dijmin ên herifandina hevgirtina civakî pêk werin. Li Kampê jin di hemû komîn û komîteyan de cih digire. Gelek jinên ku li Efrînê cihê xwe di nav kar de ne girtibûn, piştî dagirkirina Efrînê pir çalak derbasî nava kar bûne.**
**Galya dibêje: Di encama dagirkeriyê de gelê me li van herêman valatiyeke mazin dijî. Fêr nebûye ku di cografiyeke wiha teng de tevbigere. Ev jî dibe sersebebê hinek pirsgirêkan. Keysbazên şeran, şert û encamên koçberiyê bikar dianîn. Hewl dan hişmendiya zewaca biçûk û jina duyemîn zindî bikin. Heya niha li Kampa Serdem du pirsgirêkên zewaca biçûk derketine. Gel ji ber agahiyên destdirêjiya li ser jinê li Efrînê ditirsiya jin bikeve destê çeteyan. Ji ber vê jî carinan jin biçûkî didan mêr. Lê Kongra Star bi hemû sazî û rêxistinên xwe, bi şev û roj nava tevgerê de bû. nehişt ev rêxistinbûna jinê hilweşe. Pirsgirêkên ku derdiketin bi nîqaş û civînan dihatin çareserkirin.**

## JIN ABORIYA XWE BI RÊ VE DIBIN

**Galya destnîşan dike: Rêxistina Kongra Star ji bo ku rê li ber pirsgirêkan bigire û jinan aktîv bike, gelek proje pêşxistin. Li Kampa Serdem van rojan wê sûka jin bê vekirin. Kargehên dirûnê, berberiya jinan, colfiroşî û gelek dikanên pîşeyên dîtir hatine vekirin. Wê jin bi van karan re aboriya xwe bi rê ve bibe û wê rê li ber pirsgirêkên civakî jî heya radeyekê bê giritin. Galya ji bo demên pêş jî got: Em ê di van rojên pêşiya me de dest bi perwerdeyan bikin. Wê di van perwerdeyan de lêkolîn û nerîna serokatiyê derbarê jinê de bi awayê sînefizyon bên dayîn.**

## JIN 24 SAETAN DIXEBITIN

**Galya da zanîn ku jina Efrînê li Şehbayê niha gihaye wê baweriyê ku; bila jin ji bo azadî û rûmeta gelê xwe şehîd bikeve, ji jiyana nava dagirkerî û nexweşiyên modernîteyê baştir û bi şereftir e. Galya ev tişt anî ziman: Niha di nav komînan de komîteya jin heye. Çi gazin, pêşniyarên çareseriya pirsgirêkan û çawaniya berxwedanê hebin tên nîqaşkirin. Ango 24 saetan em bi jinan re di nava têkîliyê de ne.**
**Endama Koordînasyona Kongra Star li Kampa Serdem Galya Mihemed dawiyê de bang li tevahî jinan kir ku; serî ji neyar û dijminan re netewînin û got: Pêwîste jin têgihaştin û rêxistinbûna xwe zêde xort bikin. Bila guh nedin agahiyên derew yên ji Efrînê tên. Li hemberî destdirêjiya li Efrînê ya li ser jinan pêwîste jina Efrînê serî hilde…**

# Divê Sûriyeke demokratîk bê ava kirin

**Nûnerê Partiya Sûriya Pêşerojê yê li Şehbayê Eladîn Xalid destpêkirina diyaloga MSD'ê bi rêjîma Sûriyê re erênî nirxand û diyar kir ku divê êdî şer li Sûriyê raweste û çareseriyeke aştiyane pêk were. Xalid wiha got, "Divê hemû aliyên Sûriyê li ser maseyê rûnên û çareseriyê pêş bixin."**



Nûnerê Partiya Sûriya Pêşerojê yê li Şehbayê Eladîn Xalid destpêkirina diyaloga siyasî ya bi rêjîma Sûriyê re erênî nirxand û diyar kir ku divê hemû aliyên Sûriyê li ser heman maseyê bicivin, çareseriyê bi diyalogê pêk bînin.

Di derbarê hevdîtinên Meclisa Sûriya Demokratîk (MSD) û rêjîma Sûriyê de, nûnerê herêma Şehbayê ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê parêzer Eladîn Xalid axivî û destnîşan kir ku beriya wê jî gelek serdan û parvekirina nêrînan pêk hatine.

Xalid diyar kir ku wek Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ji dema hatiye damezirandin ve ew banga diyaloga aştiyane dikin wiha got: "Cihê terorê li ser axa Sûriyê tune ye û divê şer jî di Sûriyê de bi dawî bibe."

Xalid da zanîn ku helwesta wan di aliyê çareseriya siyasî û aştiyane de ye û wiha dewam kir: "Ji ber şer Sûriye hilweşiya û welatiyên wê şerpeze bûn. Em amade ne bi hemû aliyên Sûriyê re bicivin û hevgirtina hemû pêkhateyên Sûriyê biparêzin."

Xalid destnîşan kir ku tecrubeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li Bakurê Sûriyê mînaka demokrasî û piralîbûnê ye û divê hemû aliyên Sûriyê li ser heman maseyê bicivin, nakokiyên di navbera xwe de bi rêbazên aştiyane çareser bikin.

Girêdayî hevdîtinên MSD'ê li Şamê Xalid wiha got: "Ev civîn wê kevirkoşeya danûstandinan bi cih bikin û wê komîteyên ji bo danûstandinan ava bikin."

Nûnerê herêma Şehbayê ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Eladîn Xalid di dawiya axaftina xwe de hevdîtinên MSD'ê bi hikumeta Sûriyê re erênî dît û hêvî kir ku çareseriyeke siyasî û aştiyane pêk were û Sûriyeke demokratîk, piralî û nenavendî were avakirin…*ANHA*

# Li hember dagirkeriyê biryara xebatên hevbeş girtin



KNK'ê û Eniya Niştîmanî li dijî dagirkeriyê biryar dan ku bi hev re kar bikin û rêzeçalakiyên hevbeş lidar bixin.

Li bajarê Silêmaniyê Eniya Niştîmaniya Li Dijî Dagirkeriyê û Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) civiyan. Piştî civînê herdû aliyan biryar dan ku rêzeçalakî û karên hevbeş bikin.

Di civînê de biryar hate dayîn ku roja Pêncşema bê li bajarê Silêmaniyê panelek lidar bixin. Di panelê de weke nûnerê Eniya Niştîmanî Salar Mehmud wê li ser rewşa siyasî û zererên dagirkeriya Tirk li ser Başûrê Kurdistanê baxive. Weke nûnera KNK'ê jî Zeyneb Murad jî wê li ser metirsiyên dewleta Tirk li hemberî jinan, çand û zimanê Kurdî baxive.

Diyar kirin ku piştî panela li Silêmaniyê, karnavalek li Sekoy Azadî ya Parka Azadî ya bajarê Silêmanî lidar bixin. Têde balonên bi dirûşmeyên dijî dagirkeriyê li ser nivîsî bifirînin û çend çalakiyên hunerî lidar bixin…*ANHA*

# Em ê têkoşîna xwe mezintir bikin



Berdevkê HDP'ê Sarûhan Olûç diyar kir ku divê têkoşîna civakî were xurtkirin û pêdivî bi tifaqan heye û got, "Em li ser soza xwe ne ku, hemû metodên demokratîk û alternatîf ên têkoşînê biceribînin."

Berdevkê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Sarûhan Olûç têkildarî encamên civînên Meclîs Partiyê û Desteya Rêveberiya Navendî ya HDP'ê li navenda giştî ya partiya xwe civîna çapemeniyê li dar xist.

Olûç bal kişand ser cezakirina Zarok TV û got: "Bi sedema di Zarok TV de stranek peyva 'Kurdistan' derbas dibe ceza dane. Zarok Tv bi zimanê zikmakî weşanê dike. Çi ne ew gotin? Ji ber ku navê cihê Kurd lê dijîn peyva Kurdistan e. Ev jî bûyerek divê mirov bi tiliyê nîşan bide."

Olûç peyama piştgiriyê ya Tirkiyê ya ji bo Yunanistanê ya balafirên agirkuj bi bîr xist û wiha got: "Li Dersim, Licê, Nisêbîn û Pasûrê şewat derketin. Gelo van balafirên agirkuj çima mudaxaleyî agirê li Dersim, Licê, Nisêbîn û Pasûrê nekirin? Ji ber ku kesên li van deveran dijîn Kurd in."

Olûç bal kişand ser binpêkirinên mafan ên li girtîgehan jî û ev tişt anîn ziman: "Di demên dawîn de li girtîgehên Erzûrûm, Elezîz û Tarsûs îşkence li girtiyan tê kirin. Li gel serlêdanên malbat û parêzeran jî hê encamek nehatiye bidestxistin. Dayika Sîsê ya 76 salî hê jî li girtîgehê tê girtin. Tecrîda li ser rêzdar Ocalan jî didome û nêzî 3 salan e nikare bi malbat û parêzerê xwe re hevdîtin pêk bîne. Parlamenter Leyla Guven li girtîgehê tên girtin."


Olûç, da zanîn ku pêwîste ew xwedî li sozên dayîn civakê derbikevin û wiha bilêv kir: "Ji bo ku em hemû sozên xwe bînin cih, em ê têkoşîna xwe ya rêxistinbûyînê berdewam bikin. Pergal nû tê avakirin. Ev avakirin bi koalisyona AKP û MHP'ê berdewam dike. Mîna mûxlefetên demokratîk û civakî, divê em ji nûve pêvajoya avakirina demokratîk nîqaş bikin. Di vî warî de divê em bi biryar bin. Divê em têkoşîna ked û edaletê bi hêz bikin."

Olûç, di dewama axaftina xwe de wiha got: "Ji bo amadekariyên hilbijartina herêmî, em derbasî merheleyek nû bûn. Di rewşên awarte de, em ê biçin hilbijartinên herêmî. Li ser rêveberiyên herêmî û şaredartiyê me nîqaş bi rê ve birin. Hedefa me ya sereke ew e ku em di qada herêmî de desthilatdariya navendî dorpêç bikin. Stratejiya me ya esasî ev e. Ji ber vê em ê namzetên rast danîn û tifaqa rast ava bikin. Em li ser vî esasî serkeftinê bi dest bixin."

# Çalakgerên li Sêmalka silav kirin

Çalakgerên Mertalên Zindî bi daxuyaniyekê çalakiya ciwanên Rojavayê Kurdistanê yên li Sêmalka ji bo piştgiriya çalakiya Mertalên Zindî ya li Qendîlê û li dijî dagirkeriyê dest pê kirin, silav kirin.Çalakiya Mertalên Zindî ya Komeleya Ciwanên Welatparêzên Kurdistanê li Qendîlê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk destpêkirîn di roja 52'yemîn de dewam dike. Ciwanên Welatparêz ên Rojavayê Kurdistanê de dema ku ji bo piştgiriya wan ketin li ser rê, li Deriyê Sêmalka ji aliyê hikûmeta PDK'ê ve hatin astengkirin. Ciwanan Rojava li dijî vê astengiyê û ji bo piştgiriya çalakiya Mertalên Zindî li Deriyê Sêmalka dest bi çalakiyê kirine. Çalakgerên Mertalên Zindî bi daxuyaniyekê çalakiya ciwanên Rojavayê Kurdistanê silav kirin. Li ser navê ciwanan Bahoz Kerkûkî daxuyanî da û got; "Weke çalakgerên Mertalên Zindî, Ciwanên Welatparêz ên Rojava pîroz dikin. Hewldan beşdarî çalakiya Mertalên Zindî ya ku li vir li dijî hêzên dagirker hatî destpêkirin bibin. Lê, rastî astengiya heman hêzên zihniyeta dagirkeran parve dikin hatin. Bila vê yekê baş bizanibin ku em ê li her cihî berxwedanê mezin bikin. Em ê li dijî hikûmeta ku xiyanet ji bo xwe kiriye kelhe jî berxwedanê berdewam bikin. Em hevalên xwe yên hatin astengkirin silav dikin. Em li vir berxwedana wan pîroz dikin. Weke ciwanên weletparêz, em ê her cihî weke Qendîlê bikin warê berxwedanê. "

# Di dîrokê de fermanên li ser Êzidiyan



Qasim ENGÎN

Nivîskar û dîroknas Mehrdad Îzady, îdîa dike ku hê berî niha bi 200 salî Kurd, -bi giranî;- bi ola Êzidîtiyê, Elewî û Yarsanî ve girêdayî bûne, lê ji ber qirkirin û bi zorê ferzkirina misilmantiyê, îro nûfusa wan gelek kêm maye.

Mixabin; em neçarin diyar bikin ku di gelek fermanan de serwerên Kurdên Sunnî cîhê xwe girtine. Lê Osmaniyan ev komkujî sîstematik meşandine. Ev çawa bûye?

Dema ku em hinek ji wan Fermanan rêz bikin:

"906: Waliyê Mûsilê Hemedanî hezar malbatên Êzîdî qetil kir.

980: Hêzên desthilatdar ên li Mûsilê êrîşî Êzidiyan kirin û komkujî pêkanîn.

1107: Nêzî 500 hezar kes ji aliyê artêşên Îslamê ve hatine qetilkirin.

1245: Mogolî li Şehrezor, bi hezaran Êzidî qetil kirin.

1254: Begê Mûsilê Bedreddîn Lûlû, di êrîşa li ser herêma Şêxan de hezaran Êzidî qetilkirin.

1221: Şêx Hesen hat revandin û darvekirin.

1415: Êzidî ji aliyê misilmanan ve hatin qetilkirin.

1640-1641: Melik Paşa yê Waliyê Amedê- Osmanî, êrîşî Şengalê kir komkujî pêk anî.

1647-1648: Waliyê Wanê yê Osmanî êrîşî Şêxan kir û komkujî pêk anî.

1715: Waliyê Bexda yê Osmanî êrîşî Şengalê kir, Êzidî qetil kirin.

1733-34: Paşayê Osmaniyan Ehmed Paşa li herêma Şengalê komkujî pêk anî.

1752-1753: Silêman Paşa êrîşî Şengalê kir, Êzidî qetil kirin.

1767-68: Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan li Şengalê komkujî pêk anî.

1770-71: Osmaniyan li Şêxan komkujî kirin.

1773-74: Waliyê Mûsilê herêma Şengalê xera kir.

1779: Osmaniyan êrîşî Şengalê kir û gelek Êzidî qetil kirin.

1785: Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan Ebd El Baqî êrîşî Êzidiyan kir.

1786-87: Waliyê Amediyê yê Osmaniyan êrîş bir ser Êzidîyan.

1789-90-92: Eşîra Teyy a Ereb êrîşî Şengalê kir û komkujî pêk anî.

1792-93-94: Waliyê Mûsilê Muhammed, êrîşî Şengal û Mîhîrîkan kir.

1794-95: Silêman Paşa yê Bexdayê herêma Şengalê hilweşand û talan kirin.

1799-1800: Ebd el Ezîz Teyy li Şêxan 25 gundên Êzidiyan şewitand û wêran kir.

1802-1803: Waliyê Mûsilê Elî Paşa êrîşî Şengalê kir.

1809-1810: Waliyê Bexda Silêman Qatil êrîşî Şengalê kir; Balad, Şengal, Mîhîrkan talan kir.

1832: Bedirxan Beg êrîşî herêma Şêxan kir. Heman Bedîrxanî piştî 12 salan vê carê êrîşî Êzidiyên Tûrabdînê kir.

1832-33-34: Mîr Mihemmed Rewanduzî êrîşî Êzîdiyên li herêma Akrê û Şengalê kir.

1836: Waliyê Amedê Reşîd Paşa-Osmanî erîş bir ser Êzîdîyên Xerzanê.

1838: Hafiz Paşayê Osmanî êrîşî Şengalê kir.

1846: Waliyê Mûsilê Tayyar Paşa êrîşek bir ser Şengalê.

1853-1856: Êzîdiyên ku alîkariya Yezdanşêr kirin hatin qetilkirin.

1856: Êzidiyên li Dêrsimê di aliyê Osmaniyan de rastî komkujiyê hatin.

1872: Waliyê Bexda Mithat Paşa êrîşî Şêxan kir.

1877: 3 hezar Êzidiyên Xerzanê ji aliyê Osmaniyan ve hatin qetilkirin.

1879: Eşîra Sîpka sirgûnî Qersê û Qafqasya hatine kirin.

1890: Êzidiyên Başûrê Kurdistanê hatin qetilkirin.

1892: General Emer Wehbî Paşa, li ser Êzidiyan komkujî pêkanî. Êzidî neçar man bibin misilman. Alavên wan yên pîroz desteserkirin.

1911: General Farûq Paşa komkujî li ser Êzidî, Ermenî, Nastûrî û Qizilbaşan pêkanî.

1914-1918: Êzidîyên ku 20 hezar Ermenî li Şengalê de parastîbûn ji aliyê Osmaniyan ve hatin qetilkirin. 1918: Êzidî ji ber komkujiyên Osmanî reviyan Ermenîstanê.

1940: Leşkerên tirk li Hezexê 29 Êzidî kirin şikeftekê û ew bi zindî şewitandin.

2007: Li Siba Şêx Xidir û Tilezer Êzidî hatin qetilkirin. 2014: 3'yê Tebaxê êrîşa hovane ya DAIŞ'ê û jenosîda Êzidîyan. Bi sedhezaran Êzîdî neçar man Şengalê terk bikin."

Bi hêvîya ku êdî tevahî Kurd êşên Êzidiyan di nav dilê xwe de bi kûrahî hîsbikin û bijîn…



# Dagirkeran 30 sivîlên din revandin

**Dagirker li Efrînê kiryarên xwe yên dermirovahî her diçe zêdetir dikin û di wehşetê de sînoran nas nakin. Endamên ENKS'ê didin pêşiya çeteyan û davêjin ser malan. Li navçeya Cindirêsê çeteyên dagirker avêtin li ser malên ku ENKS'ê nîşanî wan da 30 sivîlên din revandin û zêr û zivên wan dizîn.**



Hat diyarkirin ku çeteyan li navçeya Cindirês û gundewarên wê zêdetirî 30 sivîl revandin, malên wan talan kirin û zêr û zîvên wan dizîn. Hate gotin ku ji bo kesên hatin revandin fidye tê xwestin.

Kiryarên çeteyên girêdayî dewleta tirk ên wekî dizî, talan, revandin û xwestina fidyeyê piştî dagirkirina Efrînê neqediyan û her ku diçe van kiryarên qirêjî zêde dikin. Lê her carê ji xwe re ji bo van kiryarên dijmirovî rêbazên cuda peyda dikin.

Çavkaniyekî ji herêmê ragihand ku çeteyan roja 29'ê Tîrmehê bi ser navçeya Cindirêsê û gundên wê de girt. Di ser girtina malan de bi hinceta di mala wan de zêr û zîv tune ye, ji bo ku fidyeyê bixwazin zêdetirî 30 kes revandin. Çavkanî destnîşan kir ku çeteyan di serdegirtina malan de ji gelek malan zêr û zîvên heyî dizîne.

Çavkanî, derbarê rêbazên nû yên çeteyan ên dizî, talan û taybet jî piştî revandina kesan xwestina fidyeyê de jî ev agahî dan: "Çeteyan rêbazeke nû ji bo dizî, talan û xwestina fidyeyê ji xwe re peyda kirine. Sivîlên ku niha direvînin wêneyên wan dikişînin û ji xizmên wan ên ku li Ewropayê bi cih bûne re dişînin û ji wan re dibêjin eger hûn dolar û euro ji me re bi rê nekin, em ê xizmên we bikûjin."

Li gorî çavkanî eşkere dike hin kesên ji Efrînê ku piranî endam an jî alîgirên ENKS'ê ne, didin pêşiya çeteyan û malbatên ku aboriya wan baş be, pere, zêr û zîvên wan hebin, an jî xizmên wan ên li derveyî welat (Ewropa) hene, nîşan didin. Çeteyên dewleta tirk a dagirker jî li ser nîşandana wan, diavêjin ser malan an kesan direvînin û fidyeyê dixwazin an jî rasterast dest datînin ser mal û pereyên wan. Hat destnîşankirin ku revandina zêdetirî 30 kesan û talan û diziya malan li ser vê rêbazê pêk hatiye.

# Bi qestî daristanên Kurdistanê dişewitînin



Heyeta ku çûbû lêkolîna şewata daristanan a ku artêşa Tirk li Amedê pêk anîbû, diyar kir ku gundiyan gotine bombeyên qazanê hatiye avêtin.

Heyetê got, "Em ê gelê xwe tenê nehêlin."

Parlementerê HDP'ê yê Amedê Mûsa Farisogûllarî yê ku ji ber şewitandina daristanên li Pasûr û Farqînê çûbû qadê diyar kir ku vemirandina agir hatiye astengkirin.

Heyeta HDP û KCD'ê piştî lêkolînkirina şewitandina daristanên li navçeyên Pasûr, Hezro û Licê ya di 28'ê Tîrmehê de ya ku ji ber operasyona artêşa Tirk pêk hatiye, daxuyanî da. Daxuyanî li ber avahiya bajêr a HDP'ê hate dayîn û endam, rêveber û parlementerên HDP'ê yên Amedê û rêveberên KCD'ê tevlî daxuyaniyê bûn.

Parlementerê HDP'ê Mûsa Farisogûllari got, "Ji Dersimê heta Amedê ji ber bombebaranê şewat derdikevin. Hat gotin ku Rewşa Awarte rabûye, lê di rastiyê de tenê navê wê hatiye rakirin. Roja ku hat gotin Rewşa Awarte rabûye ve şewatên daristanan li Kurdistanê dest pê kirin. Em çûn Pasûr û Licê û me lêkolîn kir. Piştî bombebaranan şewat derketine û ji ber qedexeya derketina derve gundiyan nikaribûye mudaxale bikin. Şewatên li herêma Eskar û Dorşînê yên Pasûrê hatine vemirandin. Gundiyan diyar kirin ku bombeyên qazanê hatiye avêtin û ji ber van bombeyan agir bi herêmê ketiye."

Farisogûllari da zanîn ku ji pêkanînên ku bi salan hatine ceribandin tiştek dernayê û diyrar kir ku divê dewlet ji vê yekê fem bike û dev ji van rêbazan berde. Farisogûllari di dawî de wiha got: "Hewldanên me ji bo seranserê Tirkiyê pêşxistina çareseriyê ye. Di nêzikbûna rayedarên hikumetê de ji ber dijminahiya wan a li hemberî gelê Kurd, pêkanînên ku dibin sedemê mirina mirovan hene. Em bang li rayedarên hikumetê dikin. Em vê nêzikbûna hovane ya li hemberî gelê xwe qebûl nakin. Ji niha şûn de jî wê hewldanên me bidomin û em ê gelê xwe bi tenê nehêlin."

# DYA-Talîbanê hevdîtin kirin



Hevdîtina veşartî ya navbera dîplomateke payebilind a DYA'yî û nûnerên Talîbanê li Dohayê pêk hat. Hate ragihandin ku 'işaretên gelekî erênî' ji hevdîtinê derketine.

Li gorî nûçeya ajansa nûçeyan a Reutersê, çavkaniyekî ku tevlî hevdîtinê bû ragihand, hevdîtina navbera dîplomata payebilind a DYA'yî û nûnerên Talîbanê 'işaretên gelekî erênî' daye û biryar hatiye dayin ku hin hevdîtinên din jî bên kirin.

Hevdîtin di navbera Nûnera Taybet a DYA ya Başûrê Asyayê Alîce Wells û nûnerên Talîbanê pêk hat. Rojnameya Wall Street Joûrnal ev hevdîtin ragihand, lê hîn bi awayekî fermî nehatiye piştrastkirin.

Kesê ji Reutersê re axivî ku cihê xwe di nava delegasyona ji çar kesan a tevgera Talîbanê de cih digirt, ji bo hevdîtinê got, "işaretên gelekî erênî da" û "di atmosfereke dostane de pêk hat." Hate ragihandin ku hevdîtin li oteleke li Dohayê pêk hatiye.

Berpirsyarê Talîbanê got, "Di vir de mirov nikare qala danûstandinên aştiyê bike" û wiha dewam kir: "Ji bo destpêkirina danûstandinên fermî, pêwîstî bi hin hevdîtinan hene. Me biryar dan ku di demeke nêz de ji nû ve li hev rûnên û şerê Afgan bi rêya diyalogê çareser bikin."

Li gorî heman çavkaniyê, ji ber israra tevgera Talîban hevdîtin bêyî nûnerekî hikumeta Afgan pêk hat. Li paytexta Qatar Dohayê buroyeke siyasî ya Talîbanê heye. Di navbera Talîban û Amerîkiyan de mehên dawî du hevdîtinên din hatibûn kirin. Rojnameya New York Tîmesê îdîa kir ku DYA plan dike, herêmek berfireh a nifûsa xwe kêm e ji Talîbanê re bihêle. Li gorî rojnameyê, bi saya vê taktîkê wê hêzên Afgan giraniyê bidin ser parastina bajarên Kandahar, Kûndûz û Kabûlê.

# Komên çete yên dewleta Tirk navên xwe diguherin




Komên çete yên selefî yên girêdayî dewleta Tirkiyê bi pêşnegtiya El Nusra li Îdlîbê dimînin, li dijî operasyona Îdlibê ya piştî hevdîtina Trump û Putîn hat plankirin, armanc dikin ku di bin navê Ceyş El Fetîh de, dîmenê radîkalîzmê li ser xwe rakin.

Li gor agahiyan piştî, hevdîtina Pûtîn û Trump ku beşek ji lihevkirina wan li ser Idlibê bû, rejîma Sûriyê biryara operasyona Idlibê da. Ji ber vê yekê Tirkiye metirsiyeke mezin ji bo berjewendiyên xwe yên di Sûriyê de dijî.

Hat destnîşankirin ku Tirkiye hewl dide bi hemû rêbazan vê êrîşê bide sekinandin û di heman demê de dixweze xwe li pêşiya Amêrîka weke ku ew jî dij terorê şer dike, nîşan bide. Erdogan li Îdlibê li dijî çeteyên bi navê Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) yên ku weke dest û lingê Erdogan tên pênasekirin, bi alîkariya çeteyên bi navê Artêşa Sûriya Azad wan tasfiye bike.

**HTŞ DIBE CEYŞ EL-FETÎH**

Hat gotin ku ji ber vê biryara Tirkiyê, hemû komên li Îdlibê wê hem navê xwe biguherînin û hem jî wê di bin navekê sîwanekê de kom bibin. Hat îdîakirin ku wê hemû komên li Idlibê ku komên di bin banê Heyet Tahrîr El Şam de hatibûn komkirin, wê ji niha û şûnde di bin nave Ceyiş El Fetîh de bicivin. Hat bibîrxistin ku navê El-Fetîh di sala 2015'an de Partiya Turkmenîstanên Îslamî ya li gundewarên Îdlibê, Latiqiyê û Hema de tevdigerin, weke yêdek hatibû avakirin. Ceyiş El Fetîh; Cebhet Tehrîr Sûriye ya ku komên Tevgera Nureddîn Zenkî û Ehrar El Şam di nava xwe de digirin, Heyat Tahrîr El-Şam ku Cebhet El Nusra û hemû komên di Îdlibê de di nava xwe de dihewand jî dê dibin navê sîwana bê avakirin de cih bigirin.

Hat ragihandin ku piştî biryara Rûsya û rejîma Sûriyê ya operasyona ser Îdlibê hat dayîn, dewleta tirk ji bo parastina van komên ku rasterast bi MÎT'ê ve girêdayîne serî li riyekê wiha dide.